Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

Bihayê belgeya mafê karkirinê yê penaxwazan li 1.1.2020 diguhere

Bihayên dawakirina belgeyan ji Daîreya Koçberan li 1.1.2020 bilind dibe (bû). Gava ku dawa belgeya mafê karkirinê bikî, belge bi 50 euro ye.

Bihayê Daîreya Koçberan li gor fermannameya wezareta hindir tên diyarkirin. Herwiha bihayê dawakirina belgeyên din jî diguhere.

Eger tu penaxwaz bî yan xwedîkarê penaxwazekî bî û belgeya mafê karkirinê bixwazî, dikarî dawa belgeya mafê karkirinê bikî. Divê ku tu li gel dawanameya xwe herwiha fatûreyê yan ronkirineke din pêşkêş bikî ku te bihayê meşandinê daye.

Fatûreya paredanê yan ronkirineke wiha dibe

- Fatûreya ku jê diyar dibe pare hatiye dan.
- Girteya hesaba karta krediyê ku diyar dike pare ji hesaba bankê çûye.
- Kurteya hesaba bankê ku diyar dike pare ji hesaba bankê çûye.

Dikarî dawa belgeyê ji Daîreya Koçberan bikî

Wek penaxwaz mafê te yê karkirinê divê hebe heta ku tu bikarî karê bimeaş bikî. Gava ku karekî peyda bikî, ron bike ka mafê te yê karkirinê heye û hê jî maye.

Eger belgeya karkirinê pêwîst be, forma li ser malpera me dagire. Şîretên dawakirina formê û paredanê li ser malpera me hene: migri.fi/todistuspyynnot

Belge dê zûtir bigihe te ger dawa xwe bi posteya elektronîkî yan bi nameyê bişînî Daîreya Koçberan. Eger nikarî posteya elektronîkî bişînî, dikarî dawa xwe bînî xizmetgeha daîreyê.

Xizmetgehên me sala 2020 wiha dawakirinên belgeyan werdigirin:

- Xizmetgeha Helsinki li Käenkuja pêncşeman saet 8-16.15 (ji 23.1.2020 pêve)
- Xizmetgehên din bi hejmara dorê hemû rojên vekirî

Em belgeya mafê karkirinê dişînin wê navnîşanê ya ku te daye Daîreya Koçberan an kampa xwe. Nikarî werî belgeyê ji xizmetgehê bibî.

Agahiyên zêdetir

- Mafê karkirinê yê penaxwazan: migri.fi/turvapaikanhakijan-tyonteko-oikeus
- Şîret bo dawakirina belgeyê: migri.fi/todistuspyynnot
- Heqên meşandinê li Daîreya Koçberan û agahiyên paredanê: migri.fi/kasittelymaksut-ja-maksaminen

Kurmandzhi:
Turvapaikanhakijan työnteko-oikeustodistuksen hinta muuttui 1.1.2020